



HAK-PAR: Tevgera Şex Seîd şanaziya milete Kurd e. Şex Seîd ê ku 93 sal berê hat îdamkirin, yek ji giringtirîn şexsîyetên têkoşîna azadîyê ye li Kurdistana Bakur.

Piştî Şerê Cîhanê ê yekemîn, gava Împaratorîya Osmanî hildiweşîya, Kurdistan careke dî hatibû parçekirin, di pêşengîya kemalîstan de bingehê dewleta Tirkîyê a nû hatibû danîn.

Kemalîstan, sozên ku di dema "Şerê rizgarîyê" de dabûn Kurdan hemû dabûn alîyekê, mafên kurdan yên herî bingehîn jî înkâr kiribûn.

Kemalîstan, piştî ku bi Peymana Lozanê meşrûtiyet bi destê xwe xistibûn, li ser cografîyake fire ya xwedî pir netewe dest bi projeya Turkîfîzekirinê kiribûn.

Di van şertan de Şex Seîd û hevalên xwe li Kurdistana Bakur dest bi tevgerê azadîxwezîyê kirin. Serhildana ku 1925'a de destpêkir di demeke kurt de berfireh bû. Hemû dunyayê careke din bû şahid ku gelê Kurd xwedî biryar e ji bo azadîya xwe têkoşînê bike.

Ev serhildan di eynî demê de bû şerha muxalefetê ya li dijî statukoya hêzên mezin ên emperyalîst ku li herêm lidarxistibûn.

Ev serhildana di eynî demê de bû berdewama zincîra serhildanên kurdan yên dewra Dewleta Osmanî ku di dewra Dewleta Komara Tirkîyê de jî pêk hat.

Serhildana Şex Seîd, manifestoya Milletê Kurd ya li dijî siyaseta Dewleta Komara Tirkîyê ya înkarkirin, tunekirin û asîmîlasyonê ye.

Herçend bi xwînê, bi hîle û zordestîyê hatibe şkestin jî, tu wextê agirê azadîyê nehat vemirandin.

Şex Seîd û hevalên xwe, piştî ku hatin îdamkirin hema li eynî meydanê li şûneke ne dîyar hatin binaxkirin û heta îro jî cîyê mezal bi biryara resmî ya dewletê tê veşartin da ku kurd nizanibin li ku ye.

Di serî de malbatên rêberên serhildanê, bi deh hezaran kurd hatin nefîkirin. Kemalîst bi hukmê

rejimeke zordestîya giran, herêm û heta hemû Tirkîye kirin wek zîndaneke bi xwîn û tarî ancax wisa karibûn li ser pîya bimînin.

Ji ber ku gelê Kurd stû xwar nekir, dest ji daxwaza mafên xwe yên heq û meşrû nekişand.

Îro rewş diguhure.

Ew statuya ku sedsal berê li dijî gelê me hatibû danîn îro berbi hilweşînê ve diçe, Rojhilata Navîn ji nûve tê avakirin û parçê başûr ê welatê me hatîye ber şêmûga serxwebûnê. Li Bakur, Başûr, Rojhilat û li her cîyê ku Kurd lê hene, ala têkoşîna azadîyê bi şeref tê bilindkirin.

Bila herkes bizane ku îro jî, digel hemû êş û azaran, hemû xiyanet û hîlebazîyên dewletên dagirkeran jî, keç û xortên Kurd wan gotinên ku Şêx Seîd li ser sêpê gotibûn, wek emanet û talîmatekê di dilê xwe de xwedî dikin.

Wek HAK-PAR, di 93.salîya wefata Şêx Seîd û hevalên wî yên ku pê re hatibûn îdamkirin, em ji wan re rehmetê dixwazîn û bi rêz û wefadarî wan bi bîr tînin.

Berî hertiştî em daxwaz dikin ku îtîbara Şêx Seîd, Seyîd Riza û Seîdê Kurdî li wan bête vegerandin û cîyê mezelê wan bê eşkerekirin.

02.07.2018

Partîya Maf û Azadîyan

HAK-PAR Buroya Çapemenî